Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 385 nameronahi@gmail.com 30 - Gulan - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Li Şehbayê çandinî îsal ne başe

Li kantona Şehbayê û tevahî herêmên Bakurê Sûriyê dema çinîna zeviyên ceh destpê kiriye. Cotkaran destnîşan kirin ku berhem îsal ji sedî 50 kêm bûye. Li kantonê embar û cihên depokirina genim û ceh nîne. Berê hemû genim li Efrînê dihate depokirin.
Jêdera jiyanê ya sereke ya piraniya şêniyên kantona Şehbayê çandiniye. Cotkarên katnonê ceh, genim, zebze û gelek cûreyên din ên çandiniyê diçînin. Şêniyên Şehbayê piştî aloziya Sûriyê berhemên xwe li katnona Efrînê difrotin.
Cotkarên Şehbayê dest bi çinîna zeviyên xwe yên ceh kirin. Ji ber barîna baranê îsal kêm bû, berhemên zeviyan pir kêm bû. Di heman demê de baran û lehiyên dereng hatin jî gelek ziyan li zeviyan kirin. Ev bû sedema ku berhem gelekî kêm bibe.
Berhem pir kêm e û cotkar ji vê yekê bi tirs in. Îsal berhem bi rêjeya berhemên genim kêm bûye. Ev bûye sedema ku bi tonan berhemên îsal ji zeviyên ceh, genim, kemûn, nok, fûl û herwekî din jî kêm bibe.”
Cotkarên herêmê destnîşan kirin ku xisarên wan ên îsal pir kêm bûye û di gelek zeviyan de mesrefa xwe dernexistiye. Cotkaran dane zanîn ku berhemên zeviyan îsal ji sedî 50 kêm bû ye.
Serokê Komîteya Çandiniyê ya Şehbayê Sibhî El-Ehmed derbarê mijarê de da zanîn ku berhemê ceh û genim a îsal gelekî kêm bûye û wiha dom kir: “Di heman demê de depoyên me nîn in ku em ceh û genim, depo bikin. Beriya niha me 18 hezar ton genim li kantona Efrînê depo dikirin...*ANHA*










## Li Teqayê xebatên çandiniyê




Komîteya Çandiniyê ya girêdayî Meclîsa El-Curniyê dest bi jimartina zeviyên çandiniyê dike û destûrên çandiniyê di çarçoveya alîkariya bi xebatên çandiniyê li herêmê de pêşkêşî cotkaran dike.
Li ser biryara Karîgeriya Çandiniyê ya girêdayî Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a herêma Tebqayê, Komîteya Çandiniyê ya Meclîsa El-Curniyê dest bi jimartina zeviyên çandiniyê kir. Di encamê de hejmara cotkarên li ba komîteya çandiniyê hatine qeydkirin û destûr wergirtine 187 cotkarên El-Curniyê û gundewarên wê ne. Jimartina zeviyan hê jî berdewam dike.
Armanc ji vê yekê ew e ku tedbîrên qanûnê bêne standin û rêbazên alîkariya bi cotkaran re bêne hêsankirin, weke peydakirina tova çandiniyê, semad û sotemeniyê.
Li gorî Komîteya Çandiniyê dê ji bo her hektareke zeviyan 20 lître mazot û 400 kîlo seman peyda bike. Her wiha wê tova çandiniyê jî bi hemû cûreyên wê di herdu demsalên havîn û zivistanê de peyda bike.
Girêdayî mijarê Endamê Komîteya Çandiniyê ya bajaroka El-Curniyê Xalid El-Şihab axivî û diyar kir ku çalakiya qeydkirina cotkaran hê jî berdewam dike û wê li seranserî herêmê pêk were.
El-Şihab da zanîn ku ev çalakî dikeve xizmeta cotkaran da ku bi hêsanî alîkariya wan a çandiniyê were kirin û karibin berhemên xwe ya çandiniyê bi hêsanî bifiroşin...*ANHA*

## Li Reqayê isal genim kêm e



Cotkarên gundewarên rojhilatê Reqayê dest bi hilberîna gemin kirin. Cotkarên herêmê diyar kirin ku ku barana dawî bandoreke neyinî li ser berhem kiriye.
Cotkarên gundewarên rojhilatê Reqayê dest bi hilbirîna genim kirin. Di encama barana dawî ku li herêmê barî bû ziyanên mezin gihiştin zeviyan û cotkaran xisarên mezin dîtin.
Cotkarê bi navê Ebdulkerîm El-Cebar ji bajaroka Keramê ye diyar kir ku berhemê îsal li beramberî yê par pir kêm e, ji ber barana dawî barî ziyaneke mezin li genim bû.
El-Cebar da zanîn ku berhemê par ji her donimekê 5-6 kîs genim derdiket lê yê îsal tenê 1-2 kîs derkeve...*ANHA*

## Cîgehê Îbrahîm Xelîl ji nûve tê çêkirin





Komîteya Ewqaf a Kantona Girê Spî dest bi temîrkirina Cîgehê Îbrahîm Xelîl a li gundê Eyn Arûs kir. Cîgeh di sala 2013’an de ji aliyê çeteyên DAIŞ’ê ve hatibû ruxandin.
Komîteya Ewqaf piştî erêkirin û lêkolîna Meclîsa Katnona Girê Spî dest bi temrîkirina Cîgehê Nebî Îbrahîm Xelîl û mezgefta wê kir.
Xizmetkarê Cîgeh Hecî Elaya diyar kir ku çeteyên DAIŞ’ê dema herêm dagirkirin di sala 2013’an de cîgeh ruxandin.Mudîrê Komîteya Ewqaf Îsmaîl El-Îdan derbarê mijarê de da zanîn ku piştî lêkolîn û amadekaririna projeya temîrkirinê, wan proje ji Meclîsa Kantona Girê SPî re pêşkêş kirin, da ku fatoreyên temîrkirinê bide.
Cîgeha Ibrehîm Xelîl yek ji cihên dîrokî yên herêmê ye. LI gundê Eyn Arûs hatiye çêkirin. Kaniya Eyn Arûs û Cîgeh bûne sedema ku welatî serdana herêmê bikin... *ANHA*

# Kurdistanê weke axa Osmanî dibînin

***Endamê Komîteya Rêveber a PKK’ê Dûran Kalkan armanc û encamên êrîşên dagirkeriyê yên li dijî başûrê Kurdistanê nirxand û diyar kir ku dewleta Tirk bi destûra Iraq û rêveberiya Hewlêrê li başûr dimîne. Kalkan got, “Ya esasî ew e ku di çarçoveya têkiliyên bi DYA û NATO’yê re dewleta Tirk leşkerên xwe li Başûrê Kurdistanê dihêle:”***



- Dûran Kalkan diyar kir ku Bi operasyona Lêlîkanê re niha qala ketina nava Başûrê Kurdistanê ya bi 20 kîlometreyan dikin û wiha got, “Beriya niha, di salên 1990’î de hê bêhtir dabûn nav. Tankên Tirk gihîştibûn heta Hewlêrê. Hîn wêdetir qereqolên artêşa Tirk, yekîneyên wan ên tank û topan hene. Erdogan dibêje, ‘Kurdistan a Osmanî ye, axa Osmanî ye, em xwediyê vê axê ne’. Dixwazin di vê çarçoveyê de tevbigerin.”
- Kalkan da xuyakirin ku armanceke bingehîn a dewleta Tirk ji operasyonan, têkbirina PKK’ê û perçiqandina gerîla bû û ev tespît kir: “Destpêkê li ser sînor, li Botanê, li hin herêmên Bakurê Kurdistanê tevdigeriyan, lê niha li çar parçeyên Kurdistanê belav bûne. Gelo karîbû pêşî li PKK’ê bigire? PKK niha bûye rêxistinek ku ji aliyê tevahiya cîhanê ve tê naskirin. PKK ne tenê li Kurdistanê û Rojhilata Navîn veguheriye hêzeke mezin. Bûye Tevgereke Azadiyê ya mezin.”*R-4*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 385 30 - Gulan - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Dengê Gel, Ronahî



*R-6*

# JI DAGIRKERIYÊ RE ÊDÎ BES E



***Roja 26’ê Gulanê li seranserî bakurê Sûriyê û Cîhanê li dijî dagirkeriya dewleta Tirk ya li ser Kurdistanê çalakiyên girseyî hatin lidarxistin. 26’ê Gulanê li tevahiya Cîhanê weke “Roja Li Dijî dagirkeriya Dewleta Tirk ya li Ser Kurdistan û Efrînê” hat ragihandin.***

## GELÊ EFRÎNÊ WÊ BERXWEDANÊ BIDOMÎNE

Li herêma Şehbayê jî bi boneya şermezar kirina dagirkeriya Tirk ya li Efrînê meşeke girseyî hatibû lidarxistin. Welatiyên Efrînê yên ku beşdarî vê çalakiyê bûn diyar kirin gelê Efrînê wê heta dawiyê li dijî dagirkeriya Tirk li ber xwe bide. Her wiha welatiyên Efrînê bang li hêzên navnetewî kirin ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk ya li Kurdistan û Efrînê bibin xwedî helwest. *R-6*

## LI EWROPAYÊ MEŞÊN GIRSEYÎ

Bi munasebeta vê rojê gelê Kurd û dostên gelê Kurd yê li Ewropa jî di çarçoveya “Roja rabûna li ber dagirkeriya Tirk” de êrîşên dewleta Tirk ên li ser Kurdistanê şermezar kirin. Li Fransa, Belçîka, Îtalyayê bi hezaran tevlî meşên girseyî bûn. Di meşan de dagirkeriya dewleta Tirk ya li Kurdistanê hat şermezar kirin û berxwedana gelê Kurd hat silav kirin. Her wiha li dijî dagirkeriyê banga piştgiriyê hat kirin. *R-2*

## Forma jinên Sûriyê hat lidarxistin

Forma jinên Sûriyê di bin navê “Karên pêş yên jinên Sûriyê li bakur, başûr û rojhilatê Sûriyê” li eywana Sehara ya bajarê Qamişlo hat lidarxistin. Kordînatora Giştî ya Meclîsa Jinên Sûriyê Lîna Berekat axftina vekirinê kir û bal kişand li ser rêxistinkirin û parastina jinan. Di civînê de li ser girîngî û plansaziya xebatên jinan nîqaş hatin kirin. *R-2*

## Çareserî bi azadiya Ocalan pêkan e

PJAK’ê li Ewropa di 24-26’ê Gulanê bi dirûşmeya ‘Bi rihê berxwedana serdemê, ber bi Kurdistanek azad û Îranekî federal’ ve konferansek lidar xist. Di konferansê de hate gotin ku azadiya Ocalan kilîda çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn û Kurdistanê ye. Di konferansê de biryara xebata ji bo azadiya Ocalan hat girtin. *R-5*

## Li Xakurkê berxwedaneke mezin heye


Êrîşên dewleta Tirk ya dagirker li dijî başûrê Kurdistanê berdewam dike. Dewleta Tirk li hember hêzên gêrîla derbên giran dixwe. Yek ji fermandarên gêrîla yê eniya Xakurkê Kendal Denîz diyar kir ku li Xakurkê li dijî êrîşên artêşa Tirk berxwedaneke xurt ya hêzên gêrîlla heye. *R-2*



## Êdî serdemek bê AKP dest pê dike


Hevseroka Giştî ya HDP’ê Pervîn Bûldan, li bajarê Tirkiyê Îzmirê di vekirina buro hilbijartinê ya HDP’ê de derket pêşberî hezaran û diyar kir ku êdî serdema AKP’ê bi dawî buye û wê di 25’ê Hezîranê de serdemeke nû dest pê bike. Buldan wiha got, “’Ev hilbijartin wê çarenûsa gelên Tirkiyê diyar bike. Gel wê biryara li ser tarîtiyê yan jî li ser ronahiyê bide.” *R-3*

## Tirkiye li Efrînê sûcên şer dike



Kordîneya Giştî ya Meclîsa Jinên Sûriyê Lîna Berekat diyar kir ku dewleta Tirk bi riya revandin, destdirêjî û kuştina welatiyan li Efrînê sûcên şer dike. Lîna wiha got, “Dewleta Tirk li Efrînê bi koçberkirina welatiyên Efrînê û bi cihkirina malbatên biyanî qirkirina etnîkî û guhertina demografîk pêk tîne.”*R-3*

## Êdî dem hatiye faşîzm were têkbirin




Endamê Konseya Rêveber a KCK’ê Xebat Andok, diyar kir ku hilbijartinên 24’ê Hezîranê wê bibe dawiya faşîzma AKP’ê û wiha got, “hilbijartinên 24’ê Hezîranê ji bo tolhildana Sûr, Cizîr û her wiha dagirkirina Efrînê firsendeke girîng e. Êdî dem hatiye ku ev pergala desthilatdar û faşîst bê rûxandin.” *R-4*

## Yên bawer nakin bila li Îmraliyê binêrin



Namzetê Serokkomariyê yê Partiya Demokratîm a Gelan HDP’ê Selaheddîn Demîrtaş diyar kir ku defin kirina gelekî wisa ne hêsane û got, “Berxwedana herî mezin li Girtîgeha Îmraliyê ye. Yên bawer nakin bila li Îmraliyê mêze bikin.” Demîrtaş da zanîn ku tiştekî Erdogan êdî bide gelên Tirkiyê tuneye û got, “Erdogan weke bazirganekî têk çuyî lê hatiye.” *R-4*

## YE dema cezayên li ser Sûriyê dirêj kir



Parlementoya Yekîtiya Ewropayê daxuyaniyek da û dema cezayên li ser rêjîma Sûriyê heta Hezîrana 2019’an dirêj kir. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku di çarçoveya cezayan de wê Suriye petrola xwe bikar neyne, pereyên ku di bankên YE de ne neyên bikar anîn. Înternet û toreyên telefonan wê werin şopandin. *R-2*

# Forma jinên Sûriyê hat lidarxistin

***Forma jinên Sûriyê di bin navê "Karên pêş yên jinên Sûriyê li bakur, başûr û rojhilatê Sûriyê" li eywana Sehara ya bajarê Qamişlo hat lidarxistin. Kordînatora Giştî ya Meclîsa Jinên Sûriyê Lîna Berekat axftina vekirinê kir û bal kişand li ser rêxistinkirin û parastina jinan. Di civînê de li ser girîngî û plansaziya xebatên jinan nîqaş hatin kirin.***

Li ser banga Desteya NY ya Jinan, bi sponsoriya Meclîsa Jinên Sûriyê û bi alîkariya Kongreya Star û Rêxistina Zemîna Hevbeş forma danûstendinê di bin navê "Karên pêş ên jinên Sûriyê li bakur û başûr-rojhilatê Sûriyê" li bajarê Qamişlo lidar xist.
Forma ku ji aliyê Meclîsa Jinên Sûriyê ve hate lidarxistin, bi beşdarbûna dehan çalakvanên jin û endamên tevgerên jinan ên ji bo mafê jinan de kar dikin, her wiha endamên saziyên civaka sivîl li Salona Sehara ya bajarê Qamişlo hat lidarxistin. Di formê li ser girîgiya plankirina karên taybet ji bo jinan nîqaş hatin kirin.
Kordînotora Giştî ya Meclîsa Jinên Sûriyê Lîna Berekat axftina vekirinê kir û wiha got: "Girîngiya avakirina werşeyek ji bo xebatên jinan, da ku rewşa jinên Sûriyê di rewşa şer de were analîzkirin, pir girînge. Her wiha xebatên pêşîn ên saziyên parastina jinên Sûriyê esas werigin girtin. Jinan çawa ji qanûnên jinan sûd wergirtin û çawa bi xwe biryara xwe da. Jin wiha dikarin parastina xwe û malbata xwe bike. "
Paşê li di formê de li ser rêbaza çareserkirina kêşeyên jinan li bakur û bakur-rojhilatê Sûriyê di aliyê civakî, aborî, siyasî, qanûn, parstin û ewlekariyê de nîqaş hatin kirin…



## Jinên Kurd li Fransayê kongreya xwe ya duyemîn pêkanîn



Tevgera Jinên Kurd a li Fransayê (TJK-F), kongreya xwe ya duyemîn li paytexta Fransa Parîsê li dar xist.
Kongreya duyemîn a Tevgera Jinên Kurd a li Fransayê (TJK-E) li Navenda Civaka Demokratîk a Kurd a Parîsê pêk hat. Ji 13 meclîs û komunên jinan ên li Parîsê zêdeyî 100 delege tevlî kongreyê bûn.
Piştî deqeyeke rêzgirtinê ji bo bîranîna şehîdan, dîwan hate hilbijartin û rojeva siyasî hate nirxandin.
Delegeyan gotin, "Eger îro li her herêma Kurdistanê têkoşîna jinê heye û em dikarin li Ewropayê bixebitin, ev yek ji ber têkoşîn û sîstema me ya bê navber a li dora nirxên hevpar e. Têkoşîna me li çar aliyên Kurdistanê didome. Keda jinê li Rojavayê Kurdistanê di asta herî bilind de xwe nîşan daye."
Piştre rapora li ser karê salekê hate xwendin û nirxandin. Delegeyan li ser rê û rêbazên kar ên li dora azadîparêziya jinê ya serdema nû gotûbêj kirin.
Piştî ku koordînasyonek ji 7 kesan hate hilbijartin, kongre bi qîrîna dirûşma "Jin, jiyan, azadî" qediya.

## YE dema cezayên li ser Sûriyê dirêj kir

Parlementoya Yekîtiya Ewropa cezeyê ku li ser Rêjma Sûriyê û alîkarên wê ferz kirine heta Hezîrana 2019`an dirêj kir.
Parlementoya Yekîtiya Ewropa derbarê cezayên li ser rêjîma Sûriyê û alîkarên wê de daxuyanî da. Ji ber rêjîm sivîlan digre meclîsê dema cezayan li ser Rêjîma Sûriyê heta Hezîrana 2019`an dirêj kir.
Di daxuyaniyê de hate gotin ku meclîsê agahiyên girêdayî kesan û aliyên li ser lîsteya cezakirinê nû kir. Navê du kesan ji ber mirine, ji lîsteyê hate derxistin. Di dema niha de 259 kes û 67 alî di lîsteya YE ya cezaya Sûriyê de ne. Di nava cezayan de derketina derveyî welat hatiye ferizkirin û di aliyê madî de jî hatin ceazkirin.
Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku cezayên li ser Sûriyê hatiye ferzkirin ku petrola xwe bikar neyne, pereyên ku di bankên YE de ne neyên bikar anîn. Înternet û toreyên telefonan wê werin şopandin.



## Li dijî dagirkeriya Tirk rabûn

Kurdistaniyên li Ewropayê dijîn, di çarçoveya "Roja rabûna li ber dagirkeriya Tirk" de êrîşên dewleta Tirk ên li ser Kurdistanê şermezar kirin.
Li bajarê Toulouse yê li Başûrê Fransayê, Kolektîfa Piştgiriya bi Gelê Kurd re, ku ji Navenda Civaka Demokratîk a Kurd, partiyên siyasî, sendîka û rêxistinên civakî yên sivîl pêk tê, bi wesîleya rojê meşek organîze kirin.
Di meşê de dirûşmên "Kujer Erdogan", "Terorîst Tirkiye" hatin qîrîn û ji bo boykotkirina tûrîzma Tirk belavok hatin belavkirin. Nûnerê KCDK-E jî ji bo gelê Efrînê banga piştgiriyê kir. Di dawiya meşê de mîtîng hate lidarxistin û bi qîrîna dirûşma "Bijî berxwedana Efrînê" qediya.
Li bajarê Florensa yê Îtalyayê, bi beşdariya gelek enternasyonalîstan mîtîngek hate lidarxistin. Nêzî 800 kes tevlî mîtîngê bûn.




Li paytexta Belçîka Brukselê, li Komeleya Çanda Kurdan, Navenda Civaka Demokratîk a Kurd û Komîteya Malbatên Şehîdan li dijî dagirkirina Efrînê civînek li dar xistin. Di civînê de şehîdên meha Gulanê jî hatin bîranîn. Hevserokê KONGRA-GEL Remzî Kartal û nûnerê PYD'ê Koçer Hesekê jî tevlî civînê bûn.
Hevserokê KONGRA-GEL Remzî Kartal bi bîranîna şehîdên têkoşîna azadiyê ya Kurdistanê dest bi axaftina xwe kir û işaret bi berxwedana Rojava û Efrînê kir. Kartal wekî din, hilbijartinên 24'ê Hezîranê yên li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê bi bîr xist û destnîşan kir ku HDP wê dawî li dîktatoriya Erdogan bîne.

## Bi hezaran cenazeyê şervanê enternasyonalîst oxirkirin



Cenazeyê şervanê YPG'ê yê Spanyayî Kendal Ramon bi merasîmekê li Dêrikê hate veşartin.
Şervanê YPG'ê yê Spanyayî Ramon Maria Rull Linhof (Kendal Ramon) ku 13'ê Gulanê li gundê Baxoz ê Dêra Zorê şehîd bû, li ser wasiyeta wî li Rojava hate veşartin.
Gelê Dêrikê cenazeyê Kendal Ramon ji nexweşxaneya Şehîd Hogir rakir û bi konvoyek ji wesayitan bir Şehîdgeha Xebat Dêrik.
Cenazeyê Ramon li şehîdgehê bi merasîma leşkerî ya şervanên xweparastinê hate pêşwazîkirin.
Ji Tabûra Enternasyonalîstan a YPG'ê Heqî Nivîskar bi Îngilîzî axivî û qala têkoşîna Şehîd Kendal Ramon a li Rojava û Dêra Zorê kir. Nivîskar diyar kir ku Ramon ji nêrîna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bawer dikir û got, "Kendal Ramon ji bo rûmet û azadiya gelan û nirxên neteweya demokratîk biparêze ji Spanyayê hat." Heqî Nivîskar destnîşan kir ku wê li ser şopa şehîdan bimeşin.
Cenazeyê Kendal Ramon li ber tilîlî û dirûşmeyan hate veşartin.

## Şandeyek Elman hat Rojava



Şandeyek ji Elmanya bi armanca şopandina rewşa herêmê hat Rojava bûye. Şande ji aliyê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Cizîrê de hat pêşwazî kirin.
Şandeyek ku ji Perlemanterên Elman û Endamê Partiya Çep a Elmanya, her wiha hejmarek akademisyen pêk tê di Deriyê Sêmalka a di navbera Başûr û Rojava re derbasî Rojava bûn. Şande ji aliyê Cîgirê Serokatiya Desteya Têkiliyên Derve ya Herêma cizîrê Fener El-Giêt û Seroka Desteya Jinan Emîna Umer ve hate pêşwazîkirin.
Şandeyê ji Sêmalka berê xwe dan Navenda Desteya Têkiliyên Derve ya li bajarê Qamişlo, li vir jî Hevseroka Desteya Karê Derve ya Kantona Cizîrê Sîham Qiryo pêşwaziya şandeyê kir. Şande wê li rojava hin dan û standinan bike.



# Hezar û 500 pirtûk hatin dîtin


***Li Reqayê roj bi roj şopên wêraniya DAIŞ'ê derdikeve holê. Komîteya Çand û Hunerê ya bajarê Reqayê Hezar û 500 pirtûkên li nêzî nexweşxaneya watenî ku di bin xirabeyan de mabûn dîtîn. Hat gotin ku pirraniya pirtûkan bi zimanê Fransî û Îngilizî ne û li ser doktoriya mirovan e.***



Li Reqayê di xebatên rakirina bermahiyan de hezar û 500 pirtûkên derbarê bijîkşa mirovan yên bi nirx hatin dîtin.
Komîteya Çand û Hunerê ya bajarê Reqayê hezar û 500 pirtûkên ku li navenda sendîqaya Endiziyaran a berê ku li nêzî nexweşxaneya Wetenî ya Reqayê ye, dîtin. Pirtûkên ji bin bermahiyan hatin derxistin derbarê bijîşkiya mirovan bû.
Endamên komîteyê destnîşan kirin ku pirtûkên hatine dîtin pir bi nirixin û buhayê her pirtûkekê derdora 100 hezar lîreyên Sûriyê ne. Hate gotin ku piraniya pirtûkan bi zimanên Firansî û Ingilîzî ne.
Komîteyê pirtûk birin navenda Komîteya Çand û Hunerê ya Meclîsa Sivîl a Reqayê da ku li wir parastina wan bike û di salên pêş de sûd ji wan pirtûkan were girtin.
Endamê Komîteya Çand û Hunerê Ebdulah El-Xelef derbarê mijarê de da zanîn ku ew xebatên xwe yên lêgerînê didomînin û got: "Em hîn di bin bermahiyên dibistan û navendên çandê digerin."… *ANHA*

## Pirtûkên qedîm li ber tinebûnê ne





Pirtûkên dîrokî yên ku beriya 200 salan bi dest hatine nivîsîn, dibin metirsiya tinebûnê de ne. Bi hezaran pirtûk di pirtûkxaneya Biyare de hene. Lê ji ber ku ev pirtûkên kevin yên bi dest hatine nivîsîn, ji nûve nehatine çapkirin dibin metirsiya tinebûnê dene.
Pirtûkxaneya Biyare di sala 1885'an de li navçeya Hawraman a ser bi parêzgeha Helebce, ji aliyê Şêx Emer Şêx Ziyabendê Neqşebendî ve hatiye çêkirin. Divê pirtûkxaneyê de nêzî hezar pirtûkên bi dest hatİn nivîsîn hene. Di nava pirtûkan de, pirtûkên zanistî, olî, helbest û dîrokê hene.
Dema ku ev pirtûkxane hatî avakirin, wê demê ji aliyê gelek kesan ve pirtûkên bizimanê Kurdî, Erebî û Farisî hatine danîn.
Berpirsyarê pirtûkxaneya Biyare Mela Faxir Mihemed Şeqlaweyî li ser rewşa pirtûkên ku li ber windabûnêne axivî û got; "Beriya niha demek, ji aliyê rêveberê pirtûkxaneya Silêmanî a giştî ve, bi armanca zêdetir parastina van pirtûkên bi dest hatine nivîsîn, zêdetirî 400 pirtûk birin pirtûkxaneya giştî ya Silêmaniyê. Li wê derê jî niha tên parastin. Me ji wan xwest ku her pirtûkek herî kêm carek were çapkirin da ku winda nebin. Lê ev daxwaza me pêk nehat."
Şeqlaweyî diyar kir ku ji bo parastina van pirtûkan ne hikûmet ne jî ti hizbek alîkarî ne daye wan û ew parastina van pirtûkan bixwe dikin.
Beriya niha jî gelek caran deriyê pirtûkxaneyê ji aliyê hinek koman ve hatiye şikandin û ziyan gihiştiye pirtûkan. Herwiha di dema rejîma Baas de ji ber gund hatin valekirin ziyan gihişt pirtûkxaneyê. Pirtûkên bi dest hatîn nivîsîn ji ber ku cara dûyem nehatine çapkirin, dibin metirsiya tinebûnê dene. Di nava pirtûkan de gelek pirtûkên dîrokî, çandî, zanistî û olî hene. Ev pirtûk hemû bi dest nivîsa wê demê hatine nivîsîn…*ROJNEWS*

## Helbest rêya ravekirina nerazîbûnan e



Helbestvanê Kurd Rojeng Rojbîr diyar kir ku derbarê destpêka helbestê de gelek nîqaşên cuda hene û got; "Ne tenê di civaka me de li hemû dinyayê, di heman serdemê de dest pê kiriye. Ji ber ku helbest rêya ravekirina nerazîbûnan e."
Li ser helbesta Kurdî helbestvanê Kurd Rojşeng Rojbîr diyar kir ku helbest rêya ravekirina bertekan e û got, "Ya ez pê bawer im, an jî dixwazim pê bawer bibim, berî pêşketina ziman, bi çav, hishisîn, gurpegurpa dil, deng , pelandina bireserekî an jî kirdeyekî re dest pê kiriye. Xwe lê girtina helbestê, qada herî zehmet ya edebî ye, ji bo kesên ku bi helbestê ve mijûl nabin, ravekirina vêya, ji xwe lê girtina helbestê jî zehmettir e. Bêeleqeya ji bo berheman, ji xuliqandina berheman bêhtir diwestîne. Siyaseta ku li ser welêt tê ferzfirin xwîneran ji xwendinê bêhtir, ber bi temaşekirinê ve bir. Ji bo nivîskarekî, berdêla van trajediyan helbet berhemdayîn e."
Rojbîr di dewama axaftina xwe wiha got, "Nivîskar, ji bo populîstiyê dest ji heqaniyetê berdan. Ji ber hê bêhtir bi nivîsê ve mijûl im, min peyva nivîskar bikar anî. Bi hemû kesên ku bi beşên hunerê ve mijûl in re peyda bû. Ev nexweşî bû, bi çend kesî re peyda bûbû, di pey re li hemû kesî/ beşî belav bû. Yek ji encama vê kambaxiyê, ya herî sereke jî ev e, kir ku tu berhemên baş derneyên. Her sal bi dehan pêşbazî çê dibin, lijne her tim heman kes in, xelatgir her tim diyar in. Xelatê nadin hunerê, didin têkiliyê. Civakeke ku êdî her titşî dizane peyda bû. Jê girîngtir, ji bo çi tu kes li ser vê bobelatê nanivîse? Pêşiyan gotiye: " Hoste ew e ku şagirtê xwe ji xwe baştir bigihîne."
Li welêt, însan ne azad e, lê dema dest ji wê dozê berdan, bi ya min du carî têk çûn. Têkçûna dubare, berî tu hay ji xwe hebî, te di nav pergalê de dihelîne, an jî pergalê bi te ve dihelîne…*MA*

## 'Bijî Serok Apo' bûye stran


Zarok bi gotin û sitranên xwe xeyalên xwe yên azadiyê didin nîşandan. Îro her zarokek ku bi fikrên Rêberê PKK'ê Abdulah Ocelan tê mezinkirin, gotina nû ku ji devê wan derdikeve " Bijî serok Apo" ye.
Dema mirov dibîne zarok di gotinên xwe de dibêjin em bi fikr û ramanên Rêberê xwe mezin dibin wê demê mirovahî bi azadiyê hay dibe. Ji ber ku zarok pêşeroja civakê ne, di dil û mejiyê hemû zarokan de xeyalên mezin yên serkaftinê hene. Pêşeroja civaka azad ev zarokên ku bi fikir û ramanên Rêberê gelê kurd Abdulah Ocelan mezin dibin e.
JI van zarokan yek jê jî keça biçuk ya êzidî Nêvîn Xabur e ku bi dengê xwe yê zelal gotinên xwe û sitranên xwe diyarî Rêberê xwe Abdulah Ocelan dike. Herî dawî Nêvîn Xabur silav û heskirinên xwe ji bo Rêberê xwe dişîne. Dilê wan zarokan bi Abdullah Ocalan lê dide. Zarokên ku berî bibêjin dayê an jî bavo dibêjin "Apo" û piştre jî bi wan tilîyên xwe yên biçûk dengê xwe hîn bilindtir dikin hewl didin kû dengê wan kesên guhê xwe girtine veke. Heta ku ev zarokên Kurdîstanê hebin wê Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan li ser ziman bibe stran û belav bibe li asîman û erdnîgarîyan. Wê kî karibe vê asteng bike?



## Mihrîcana Çandê ya Zarokan a Amedê dest pê kir



Mihrîcana Zarokan a Amedê ku ji şano, wêne, huner, kukla, drama û lîstikên pêk tê, bi karkeriya wêneyan dest pê kir.
Şanoya Bajar a Amedê, yekemîn Şanoya Zarokan a Amedê ku ji şano, wêne, huner, kukla, drama pêk tê, bi kargeriya wêneyan da destpêkirin. Mihrîncana Çandê ya Zarokan a Amedê dê heta 4'ê Heziranê berdewam bike.
Mihrîcan bi dirûşmeya "Dora min li te" hat amadekirin, li gel lîstikên zarokan Dê pêşengey û kargeriyên wêneyan jî bên pêşandan…*MA*



## Dengê Gel, Ronahî

**Medeni FERHO**

“Dengê Bakurê Suriye; Ronahî, dest bi weşana rojane dike.”
Ev sernavê nûçeya ajansa ANFê ye. Rojnameya Ronahî, wek hemû medya Kurd, li hemberî nevrotîk û îlîzyona dagirkeran, bû neynika rastiyê, di riya aqil de , bi etîkê rojnamevaniyê weşan kir.
Berhemekî “şoreşa gulîstanî” ye. Şoreş jî guhertin e, zemtkirina zimanê jiyanê ye. Şoreşa gulîstanî, di aqil de felsefe ye, di jiyana rojane de demokrasî ye. Demokrasî gel e, rêveberiya gel e. Rojnameya Ronahî bû dengê gel. Di Şoreşa Rojava de, Ronahî qonaxek e; niha jî di weşana rojane de gaveke giring avêt. Ronahî, derbaskirina dema “cahili”yê ye. Cahîliye kuştin e, dagirkerî ye, tunekirina îradeya gel e...
Demeke dirêj e, zimanê Kurdî hatiye dagirkirin; li Bakurê Kurdistanê dagirkerî dewam dike... Vekirina MED TV û gihiştina qonaxa “Medya Plaza Kurd”, şoreşa di nava şoreşê de ye. Demeke dirêj e, bi êş û azar jî be, cîhan li dora Kurdan dizîvire. Tevgera Azadiya Kurd kêşa navendî ye.
Li Kurdistanê tenê şer nîne; “şoreşek” heye û pirrengî ye. Gulbaxî, pirrengî û guhertin!.. 40 sal, di temenê gelan de, di dîrokê de ne dirêj e. Lê, “şoreşa gulîstanî”, di vî temenê kin de, medeke dûr-dirêj stand.
Gelek valahiyên dîrokî hatin dagirtin; yek ji van jî, “medya” ye. Erê, Kurdistan nebûye laburatuvarek çapemeniyê, lê di vê qonaxa bi qîr û teşqele û bi xwîn de, gavên giring hatin avêtin û bingehek hate avakirin, pîşeyekî profesyonel derkete holê... Rojnamevanan, ne tenê rojnamevanî kirin; haceganî-waqanivîsî kirin. Bernameyên wan bûne pirtûk, Faruk Sakik pirtûka ‘Bûyerên Dma Nêz’ mînak e...
Oksîjena vê çavkaniyê, gel û felsefeya modernîteya demokratîk e.
Ji bo vê jî, Medya Kurd nebûye amurê bazarê. Di şoreşa gulîstanî de, gel û baweriyên cûda hene... Çînê bazirgan nînin, hebin jî serdest nebûne û dest ne avêtina medya. Ji destpêkê û heta îro, Medya Kurd berdêl dan, astengî û zextên dijwar dîtin, lê tîtr’ek exlakî zemt kir. Vê jî, dagirker tirsandin. Bi taybetî li Bakûr... Êrîşên li dijî saziyên medya Kurd nîşana vê ne. Medya Plaza Kurd, li sirgunê ye; destîniya Rojnameya Kurdistan dijî... Ronahî, li welat e, li mîrateya Hawar xwedî derdikeve. Ev şansek e!.. Di şoreşê de, hem felsefe, hem zimanê jiyanê zemt kiriye. Ev jî encama nirx û pîroziyan e...
Hêzên serdest ku li ser cografya Kurdistanê rûniştine, ji rêbazên gerdunî, ji nirxên ademî dûr in. Destê dagirkeran, zêde zêde bi qirêj bûne, bi çi û çawa bişon paqij nabin.
Bêguman li van dewletan rojnamevanên ku bi hişmendiya etîk û normên rojnamevaniya gerdunî haraket dikin hene; lê medya, her dem bûye diranê çerxa tunekirinê. Dîse jî ez bêjim; şoreşa gulîstanî, kilîdên siyaseta inkar û tunekirinê parçe kirine û rê li ber mirovên xwedî etîk û aqîl vekir.
Wek her şoreşê, şoreşa gulîstanî jî, li ser masumiyeta komên xelkê hatiye rûnandin û da xuyakirin ku rûmeta dewletê, ji rûmeta gelan ne serdestir e. Sansura dewletê ne fermanek ezmanî ye. Îrade, aqil û karê kollektîf, ji dewletê bi hêztir û mezintir in.
Medya dagirkerên Kurdistanê jî, dagirker e; teva “mulkiyet” in, bazirgan in. Îdealên demokratîk û rêbazên etîk li cem wan nîne. Biqasî eniya siyasî, medya dagirker jî lewitî ye.
Li Kurdistanê rewş cûda ye: Rojava mînak e.
Medya Kurd, îro mecbur e bibê dadgeh, rojnamevanên Kurd jî mecbur in, hem dadger bin, hem hacegan-waqanivîs bin. Her nûçeya wan, her nirxandin û nivîsa wan ya rojane belge ye. Ya giring: Di vê qonava kin û giring de rojnamevanên medya azad, dane xuya kirin ku ew gulgeştiyê nakin. Ev pîrozî ye û serketin jî para wan e.

# Ji dagirkeriya Tirk re êdî bes e


***Di roja 26’ê Gulanê li seranserî bakurê Sûriyê li hember dagirkeriya Tirk çalakiyên girseyî hatin lidarxistin. 26’ê Gulanê li tevahî cîhanê weke Roja li dijî dagirkeriya Tirk ya li Kurdistan û Efrînê hate ragihandin. Kesên beşdarî meşa li Şehbayê bûn bang li hêzên navnetewî kirin ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk ya Kurdistan û Efrînê bibin xwedî helwest.***

**Idrîs HENAN**

Li hemberî dagirkeriya Tirk ji Kurdistan bi taybet Efrînê re, bi insiyatîva sazî, dezgeh, tevger, kesayetên navdar û gelek rêxistinên demokrat û azadîxwaz ji tevahî cîhanê roja 26 Gulanê weke Roja li dijî dagirkeriya Tirk ji Kurdistan û Efrînê re hate ragihandin. Di vê rojê de li hemû deverên cîhanê gel li ser piyan bû û bi silogan û diruşmeyan dagirkeriya Tirk şermezar kir.
Yek ji deverên ku gel têde bi coşekî mezin li ser piyan bû, Kantona Şehba bû. Şêniyên Efrîn û Şehbayê di saetên sibehê de bi hezaran herikîn kampa Berxwedan. Di meşê de daxuyanî û durşmeyên berxwedanê hatin bilindikirin û pankart hatin hildan. Beşdarên meşê nêrînên xwe bi rojnameya me Ronahî re vegotin.

### DERENG BE JÎ GAVEKE BAŞ E

Hevseroka Kantona Cizîrê Heyfa Erebo derbarê roja 26 Gulanê de ji rojnameya me re got: Roja Cîhanî ya li dijî dagirkeriya Tirk ji Bakur, Rojava û Başûrê Kurdistanê re, dereng be jî gelek bi wate ye. Berxwedana Efrînê careke din ji cîhanê re piştgiriya Tirkiyê ji çeteyên DAIŞ re eşkere kir. Erebo diyar kir ku tevî ev helwesta cîhanî derenge jî, lê



gavekî baş e. Em bi hêvî ne ev roj zextekî li hikumetan bike ku helwesta xwe eşkere bikin. Ev piştgiriya ku dewleta Tirk dide DAIŞ û yên mîna wê xeteriyekê li ser tevahî cîhanê dike. Erebo dawiyê de bang li saziyên mafê mirovan, NY, Dadgeha cînayetan û hikumetan kir ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk ji Kurdistan û tayebet ji Efrînê re bibin xwedî helwest.

### NEYÊN LÎSTOKÊN DIJMIN

Mamoste Emîne Receb Hemo got: “Tevî ku gelê Efrînê di encama zor û hovîtiya dewleta Tirk de hatiye Şehbayê, lê pêwîste bê zanîn ku gelê Kurd her zindî û li ser piyan e. Ji bo rizgarkirina Efrînê û deverên din ên Kurdistanê çi bê xwestin amade



ye. Ti carî gelê me serî ji dijminan re naçemîne. Hemo dawiyê de bang li kesên ku têne xefka dijmin û got: Çawa em bi hev re hatin, pêwîste em bi hev re jî vegerin. Bila gelê me neyê lîstokên dijmin.”

### GEL SOZA BERXWEDANÊ NÛ DIKE

Mamosteyê zanîngehê Hesen Hesen jî got: “Di vê roja dîrokî de gelê me careke din soza xwe ya berxwedanê nû dike. Efrîn wê bibe striya di qirika dijmin de. Çawa ku hêzên me yên leşkerî YPG û YPJ sond xwarine Efrînê ji dagirkeriya Tirk, çete û dizan vegerînin, gelê me jî bi rêgezên jiyana azad û hevbeş wê berxwedaniya xwe bidomîne.”

### NEYÊN BANGÊN



### XAYÎNAN

Şêniyê Efrînê Îbo Sebrî yê ji gundê Şorbe Ji kesên xwe neçarî vegera bin siya dijmin dikin re got: “Gelê me gelekî welatparêz e. Girêdayî axê ye. Lê kesên li hundir ku bi dijmin re dixebitin ji bo berbatkirin û destdirêjiyê dixapînin. Banga min ew e ku bila neyên derewên xayîn û neyaran û jiyana bê rûmet nepejirînin.”

### EM BI YPG Û YPJ BAWERIN

Rûmet Mihemed Mûsa yê ji gundê Çeqmaqya biçûk derbarê vê rojê de got: “Ji bo ku em vegerin Efrînê îro em li vir in. Ez bawerim rizgarkirina Efrînê nêz e. Bila gelê me bi sebir be û bi hêza YPG û YPJ bawer be. Vegera bi tenê rewatiya dagirkeriyê ye.”



## Aboriya xweser pêş dixe

**Melek DEMÎRTAŞ**

Weqfa jina azad li Rojava ji dema ku hatiye damezrandin perwerdeyên pîşeyî ji bo jinan vekir. Perwerdeyên ku tên vekirin dibin sedema peydakirina derfetên kar û geşkirina aboriya xweser a jinan.
Piştî jin perwerdeya xwe bi dawî dikin. li gorî pîşeya ku fêrbûne kar pêş dixin, yek ji wan kargeha dirûtinê ya Weqfa jina Azad e.
Rêvebira kargehê Helîme Mihememd di derbarê sedemên kar de got “ ez yek ji wan jinên ku li malê min dirûtin dikir û debara jiyan xwe dikir, min di riya komînê re serdanî weqfa jinê kir. Di weqfê de, piştî vekirina kargeha dirûtinê beriya du salan min dest bi kar û perwerdeya jinan kir. Her konaxek perwerdeyê sê mehan dirêj dike.”
Helîma di derbarê kar û perwerdeyê de ev tişt anîn ziman: ji dema vekirina kargehê û heya niha 80 jin perwerdeya dirûtinê dîtine. Piştî perwerdê ji sedî 90 jinên perwe4dekirî di kargeha dirûtinê de kar dikin. Kargeha dir]tin, ya Weqfê hemû reng û cûreyên cil û bergên jian û zarokan çêdike. Rojên mîna Newrozê hemû cilên kurdî didrûn.
Helîma di dawiya axaftina xwe de got “ em hêvî dikin hemû sazî bi me re alîkar bin. Weqf li gorî xwe derfetan dide. Lê; ji bi em karê xwe fireh bikin pêwîste hemû saziyên din bi mere alîkar bin.

## Pêdivî bi planek baş heye

Piştî ku bajarê Reqayê di 1’ê Mijdarê de de hate rizgarkirin, Şaredariya Gel xebatên xwe bi 10 endaman da destpêkirin û di 17’ê Sibata 2018’an de vekirina şaredariyê bi awayekî fermî hate ragihandin û ji wê demê ve tevî hemû kêmderfetan hewl dide bi riya komîteyên xwe yên cûda weke “Komîteya Avê, Komîteya kanalîzasyonan, komîteya Hawîrdor û Parkan û komîteya Çavdêriyê” hewl dide rewşa xizmetguzariyê di bajêr de pêş bixîne.
Bajarê Reqayê ji sedî 60 ji avahî û binesaziya wê hilweşiya ye. Şaredariya Gel di destpêkê de xebatên xwe li taxa El-Meşleb kir û hemû bermahiyên hilweşiyayî yên şer ji taxê rakirin. Niha jî di giştî bajêr de dixebite.
Di meha gulana 2018’an de Şaredariya Gel gelek xebat û projeyên xizmetguzariyê pêk anîn. Hin ji van xebatan ev in.
Şaredariya Gel ji destpêka rizgarkirina bajêr ve toreya ava vexwarinê û kanalîzasyonê sererast dike û niha ji sedî 75 ji toreya ava vexwarinê sererast kiriye û av ji gelek taxan re peyda kiriye.
Şaredariyê her wiha nîvê riyên hatûçûnê û parkên weke El-Reşîd, El-Bustan, El-Beyda û El-Beceha sererast kirin û darên têde hişk bûne hilkirin û gelek dar têde çandin.
Komîteyên girêdayî şaredariyê her wiha kenarên riyên sereke paqij kirin û boyax kirin.
Şaredariyê bi armanca rêgirtina li pêşiya nexweşiya Laşmaniyayê hemleyeke dermankirina taxan da meşandin. Koalîsyona Navnetewî jî di meha Gulanê de alîkarî bi Şaredariya Gel re kir, her wiha Meclîsa Sûriya Demokratîk jî gelek alav ji şaredariyê re peyda kirin.
Serokê Şaredariya Gel a bajarê Reqayê Ehmed Îbrahîm girêdayî mijarê da zanîn ku Şaredariya wan di destpêkê de ti alîkarî bi wê re nehat kirin û piştî ku daxwaz ji Meclîsa Sivîl a Reqayê hate kirin, hin alîkarî ji wan re hatin, nemaze piştî daxwaza welatiyan a sererastkirina kanalîzasyonê zêde bûn.
Ehmed di axaftina xwe de got ku sererastkirina çerxeriya El-Delê gelekî girîng e nemaze ji ber ku çanda herêmê vedibêje û xebatên sererastkirina wê dê di demeke nêzîk de bi dawî bibin.
Ehmed El-Îbrahîm di dawiya axaftina xwe de got ku astengiya herî mezin li pêş wan ew e ku bajar gelek wêran buye, lewra ji bo xebtên xizmetguzariyê pêdivî bi planeke taybet û baş heye...*ANHA*





# Tirkiye li Efrînê sûcên şer dike

***Kordîneya Giştî ya Meclîsa Jinên Sûriyê Lîna Berekat diyar kir ku dewleta Tirk bi riya revandin, destdirêjî û kuştina welatiyan li Efrînê sûcên şer dike. Lîna wiha got, “Dewleta Tirk li Efrînê bi koçberkirina welatiyên Efrînê û bi cihkirina malbatên biyanî qirkirina etnîkî û guhertina demografîk pêk tîne.”***



Kordîneya Giştî ya Meclîsa Jinên Sûriyê Lîna Berekat diyar kir ku Tirkiye bi riya revandin, destdirêjî û kuştina welatiyan li Efrînê sûcên şer dike, welatiyên Efrînê yên resen neçarî koçberiyê dike û li şûna wan biyaniyan bi cih dike.
Di çarçoveya helwestên li dijî dagirkeriya artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê li Efrînê, Kordîneya Giştî ya Meclîsa Jinên Sûriyê Lîna Berekat da xuyakirin ku Meclîsa Jinên Sûriyê bi çareserkirina aloziya Sûriyê bawer in û weke rêbaza çareseriyê diyalogê dibînin. Lîna Berekat banga cezakirina sûcdaran kir û diyar ku ew amade ne belgeyên girêdayî destdirêjiya dagirkeran radestî aliyên navnetewî bikin.
Lîna Berekat behsa destdirêjiya artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê kir û anî ziman ku ne tenê li Efrînê pêk tên, li hemû deverên Bakurê Sûriyê yên di bin dagirkeriya wê de ne pêk tên.
Lîna Berekat di berdewama axaftina xwe de diyar ku Meclîsa Jinên Sûriyê li dijî dagirkirina axa Sûriyê tevdigere û wiha got: “Piştî ku Tirkiye herêma Efrînê dagir kir, li Efrînê gelek kiryarên qirêj pêk anîn. Ên weke revandin, destdirêjî û kuştin û guhertina demografîk.”
Lîna Berekat destnîşan kir ku Tirkiye welatiyên Efrînê neçarî koçberiyê dike û li şûna wan welatiyên ji Xota, Idlib, gundewarên Dîmeşq, Humis û Hemayê bi cih dike û bi vê hewldana xwe guhertineke demografîk bi rengekî mezhebî û etnîkî pêk tîne û wiha dewam kir: “Ev siyasetên Tirkiyê li hemberî aştiya navxweyî û jiyana hevbeş ya pêkhateyên Sûriyê metirsiyeke mezin e. Kiryarên Tirkiyê li Efrînê di asta ‘sûcên şer’ de ne.”
Lîna Berekat behsa jêderên serjimariyên ku wan bi dest xwe ve anîne kir û got ku evan serjimarî ji rêxistinên mirovahî yên di Sûriyeyê de dixebitin wergirtine û hin belge Meclîsa Jinên Sûriyeyê bi xwe piştrast kirine.
Lîna Berekat di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku Meclîsa Jinên Sûriyeyê parastina mafên jinên Sûriyeyê dike û hewl dide sûcdaran ceza bike.
Meclîsa Jinên Sûriyê roja 27’ê Gulanê di derbarê destdirêjiyên artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê li Efrînê de daxuyaniyek da û li gorî daxuyaniyê dagirkeran 119 jinên Efrînê revandine û malbatên 6000 çeteyan di malên Efrîniyan de bi cih kirine…*ANHA*

## Êdî serdemek bê AKP dest pê dike



Hevseroka Giştî ya HDP’ê Pervîn Bûldan, li bajarê Tirkiyê Îzmirê derket pêşberî hezaran û got: “Em di 7’ê Hezîranê de bi ser ketin. Em dê di 24’ê Hezîranê de jî bi ser bikevin. Êdî serdema AKP’ê bi dawî bûye. 25’ê Hezîranê serdema beyî AKP dest pê dike.
Hevseroka Giştî ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) di çarçoveya xebatên hilbijartina 24’ê Hezîranê de beşdarî bernameya Rêxistina HDP’ê ya Îzmirê bû. Buldan, li Balafirgeha Adnan Menderes bi karwanek mezin hat pêşwazîkirin. Di vekirina buroya hilbijarinê ya HDP’ê Hevseroka Giştî ya HDP’ê Pervîn Buldan wiha got: “Em îro li vê derê mîtîngê li dar naxin. Em tenê buroya xwe ya hilbijartinê vedikin. Ez spasiyên xwe pêşkêşî heval, hogir û jin û mêr û ciwanên me dikim ku, îro ev der kirine wekî mîtîngekê. Îzmîr bajarekî aştî û azadiyê ye. Îro sedema ku HDP li Îzmîrê tê hezkirin ev e ku, têkiliya wê bi aştî û azadiyê heye. Namzetên HDP’ê nîşana vî tiştî ne. Di lîsteya me ya namzetan de namzetê me yê ji Afrîkayê û yê ji Behra Reş mil dane hev. Gelên Behra Reş û gelê Efrînê, gelê Kurd û gelê Tirk îro gihiştine hev û em li Îzmîrê dest bi xebatên hilbijartinê dikin.”
Bûldan wiha dewam kir: ‘’HDP hêviya aştiya welêt e. HDP baweriya bi demokrasiye ye. HDP sembola xwîşk û biratî û azadiyê ye. HDP partiya têkoşînê ya azadî û wekheviyê ya jinan e, partiyeke jinan e. Baweriya ciwanan a bi azadiyê ye. Ji bo vê jî di du hilbijartinên 24’ê Hezîranê de, em ê hem bi serkeftineke mezin parlamenteran bibin Meclîsê û hem jî em ê Selaheddîn Demîrtaş bikin Serokkomar.’’
Buldan bal kişande ser zext û zordarî û dek û dolabên AKP’ê yên li ser Kurdan û got, ‘’Me kuştinên kiryar nediyar dîtin, em hatin kuştin. Gundên me hatin şewitandin, êşkence li me kirin lê li ber ti dîktatorî me serî netewand. Me dema Tansû Çîller dît, dema Kenan Eren, me nêzîktiya Suleyman Demîrel a li Kurdan dît. Em dizanin ku politikaya îmha û înkarê ya hikûmeta AKP’ê ya li ser gelên Tirkiyê bi kêrî pîvazeke xirabe nayên, gelê me wê bersiva hewce bide.’’

### AN TARÎTÎ YAN RONAHÎ

Bûldan li ser girîngiya vê hilbijartinê rawestiya û got, ‘’Ev hilbijartin wê çarenûsa gelên Tirkiyê diyar bike. Bi vî rengî wê biryarê li ser du tiştan bide. An li ser tarîtiyê yan jî li ser ronahiyê. An wê ji zordarî, înkar, imhaya 16 salan a AKP’ê re bibêje ‘erê’ yan jî wê bibêje, ‘’na, em êdî ji AKP’ê re dibêjin, ‘Temam’, em biryara xwe li ser ronahiyê, xwîşk û biratiyê didin.’’

### WÊ TIRKIYEKE BÊ ERDOGAN BE

Hevseroka Giştî ya HDP’ê Pervîn Buldan herî dawî got: ‘’Em baş dizanin ku hikûmeta AKP’ê ne ji hêla aborî, ne çandî, siyasî û aramiyê ve tiştek nedaye civaka Tirkiyê. Êdî serdema AKP’ê qediya. 25’ê Hezîranê wê Tirkiyeyeke bê Erdogan, bê AKP’ê hebe.’’

## Li gundê Jinwar perwerdeya jineolojî




Li Gundê Jinwarê li Kampa Jinên Ciwan a Jîneolojiyê perwerde bi dawî bû. Dê perwerde li Kobanê, Şehba û li Minbicê bidome.
Di 21’ê Gulanê de li Kampa Jinên Ciwan a Jîneolojiyê ya li Dirbesbiya Bakurê Sûriyê perwerdeyê dest pê kiribû. Perwerde bi nîqaşên girîng bi dawî bû. Li Gundê Jinwar hefteyekê li ser mijarên wek dîroka jinê, etîk, estetîk, wateya jîneolojiyê û armanca wê de, nîqaşên girîng hat kirin.
Îsyan Dilsoz a ku di nav lijneya perwerdeyê de cihê xwe digire diyar kir ku ew dixwazin jîneolojiyê ji hemû jinan re rave bikin û got: “Ji her çar parçeyên Kurdistanê jin beşdarî perwerdeyê bûn. Di heman demê de jinên Ereb, Fransizî û jinên ji çandên cuda jî beşdarî perwerdeyê bûn.”
Îsyanê da zanîn ku ji dersa ewîl de hişmendiyek bi jinan re ava bû û got: “Di dersa dîroka jinê de me çanda xwedawendiyê nas kir. Me gelekî moral girt û hişmendiya me berfirehtir bû. Em hîn bûn ku di esasê xwe de jîneolojî bi sedsalan e heye lê me ev nizanîbû. Di dersa etîk û estetîk de jî me fam kir ku kapîtalizm di bin navê ‘xweşikbûnê’ de mirovan ne xweşik dike. Di dersa wekheviyê de me têgeha bihevrebûna jin û mêr a di her qadê de fam kir. Di dersa anatomiyê de têgihandina gel a li dijî bedena jinê me raxist ber çavan. Her hevalên me jiyana xwe mînak da û vê yekê jî bandorek mezin li ser me çê kir.”
Îsyanê anî ziman ku dê perwedeyên wan ên li kampa bidome û got wê li Kobanê, Şehbayê û Minbicê perwede dewam bike û meha li pêşiya me dê ji Ewropayê jinên ciwan werin û ji bo vê yekê jî plansaziya mehekê hat avakirin.
Îsyanê diyar kir ku projeyên wan ji bo hemû civakê ye û got: “Şoreşa Rojava şoreşa jinê ye. Me pêşengtiya Şoreşa Rojava girt ser milên xwe. Nasnameya jina ciwan heye lê em vê hişmendiyê di perwerdeyan de bêtir derdixin pêş.”…*JINNEWS*

## ‘Divê sucên şer bê hesab nemîn in’

**Ferîşt Nezîr**

Jinên di nava MSD’ê de derbarê binpêkirin û destsrêjiyên dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê li Efrînê yên li ser jinan bang li rêxistinên navnetewî kir ku li dijî tun û tujiya li ser jinan bê deng nemînin û ew ê belgeyan radestî dadgeha navnetewî ya sûcan bikin.
Jinên Meclîsa Sûriyeya Demokratîk bi daxuyaniyekê bîlançoya binpêkirinên dewleta tirk li dijî jinên Efrînê hat eşkar kirin. Di daxuyaniyê de hat gotin ku di navbera du mehan de 119 jinên Efrînê hatine revandin û 6 hezar malbatên çeteyan li Efrînê hatine bicihkirin.

### BÎ DEHAN JÎN HATÎN REVANDÎN

Derbarê mijarê de Rêvebira Meclisê Ebîr Hesaf got: “Dagirkerî li Efrînê kiryarên herî qirêj li dijî mirovahiyê dike, civaka navnetewî jî bêyî ku hincetekê nîşan bide bêdeng ma û maye. Ev bêdengî rê li ber dagirkirina herêmên din yê Sûriyeyê vedike.”
Ebîr serjimariya kiryarên dewleta Tirk û çeteyan vegot, “ 259 welatiyên sivîl di nav de 56 jin û 46 zarok şehîd bûn. Her wiha707 welatiyên sivîl birîndar bûne di nav de 104 jin û155 zarokin. Destdirêjî û bazirganiya jinan heta niha bêtirî 119 jin li Efrînê hatine revandin û bêtirî 200 hezar welatî ji Efrînê hatin koçberkirin, malbatên ji deverên din yên Sûriyê û taybet Gutaya Şamê li Efrînê bi cih kirin 6 hezarî ye.

### BELGE WÊ RADESTÎ DADGEHAN BÎKÎN

Berdevaka Giştî ya Meclisa Jinên Sûrî Lîna Berkat diyar kir ku ew kiryarên dewelta tirk bi riya şahidan belge kirine û wê belgeyan radestî dadgehên sucê yên navnetewî bikin.”
Lîna guhertina demigrafî wek siyaseta parçekirinê diyarkir û wiha pêde çû “ armanca guhertina demografî parçekirina axa Sûriyê û siyaseteke tirkî kirinê ferz bikin.
Lîna di dawiya axaftina xwe de de bang li hemû saziyên navnetewî kir ku kiriyarrên derqanûnî yên Tirkiyê di asta navnetewî bê şermezarkirin û bê hesab nemîne û mîna. Her wiha komkujiyên ku dewleta tirk kirin û binbêkirinên mafê mirovan mîna sûcên şer bên destgirtin.



